




Romaninvêsa Englîz
Şarlut Bruntî Û Romana(Cîn Ayer)



Amadekirin
Hîvî Berwarî

Ger miruv bala xwe bidete ser edebîyata Englîzî, bêguman bêy nivîskarên malbata Bruntî derbaz nabît, eve jî sê nivîskar û romaninvêsen xwîşk bixove digirît, ev hersê xanimên nemir evin (Şarlut Bruntî, Emîlî birunîtî û An Bruntî).

Ev hersê xwîşke kiçên rehberê girêdayî rêbaza(Kalfn)î bû, rewşa abûrî ya wan pir nexoş bû, bîrubawerên babê wan jîyana wan çarçovekir bû, ew bi tenê fêrî reşbînî û mirnê kirbûn, jalîyek dinive, nexoşîya sila mêlakê divê malbatê da hebû, hemû di temenê biçûkda dimirin, dîsan mala wan li gundekî bû beranber gorisitaneke û jîyana wan ya sext û dijwar bû û bi tenê hizir dimirnê da dikirin, piştî mirna dayka wan jiber dijwarîya rewşa abûrî, hersê kiç birine cihê zaroyên bê dayk û bab, ko eve jî girêdayî dêrê bû, ev her sê xwîşke dihavîbûn û xwe nedida li gel xelkê din, jiberku bawerî bixwe nebû hest bi kêmatîyê dikirin, bi şev û roj ev kiçe dimalda bûn, di wê jora nivistinê da bûn yaku sê alîyên wê goristan û ya reşbîn û şihgirtî bû, rojekê xwîşka mezin Şarlutê gotê werin em hersê çêrokekê binivêsin ka dê kî berî tewaw bît? hersêka dest pêkir û li ser rîyalîteya jîyan xwe nivêsa, eve jî bû destpêkek jibo her sê



xwîşkên Bruntî. dîsan van xwîşkan bihevra dîwaneka helbesta belav kir, piştî ev dîwane belav kirî , êdî van hersê xwîşkan babet li jêr navên mêran belav dikirin, Şarlutê bi nave (Kurîr Bîl) Emîlê binavê (Elîs) û An bi nave (Aktun Bîl) berhem belav kirin, jiberku li wî çaxî jinê çî mafên azadîyê û karî nebûn. Lê piştî wan dîtî romanên wan diserkeftîne, êdî wan bi navê xweyê dirust berhemên xwe belav kirin, li nîva sedsala nuzdaê herîyek ji wan bû xwedîya navdartirîn roman didîroka Englistanê da, li gorey lêkolînên ekadîmîyên Orupî çîrok û romanên van hersê xwîşkan, navdartirîn dahênanên kilasîkîne didîroka edebîyata romaninvîsîyê da. niha emê li ser xwîşka (Şarlut Bruntî) û romana (Cîn Ayer) rawestîn ko navdatirîn romana wêye û pê hatîye naskirin, divê romanê da Şarlutê rexna bîrubawerên çaxê Vîktorî kirîye, derbarey cudahîya tuxmî û çîneyetî di civakêda, regezên vê romanê serpehatîya jîyana mirovatîye, bi taybet ezmûna mirna hevala wê li dibistanê bi nexoşîya silê, eve jî mirna xwîşkên wê diînîte bîra mirovî bi heman nexoşîyê, dîsan dûrwîyatîya mamustayê tundirew oldar, bîrame li qeşe (Karus Wîlsn) diînît wek rêveberê dibistanê ko reftarên xirab beranber Şarlutê dikirin, ji alîyek dinve



kestîya (Cun Rîd) yê hertim serxoş û tiştên bê hoşîyê bikar diînît, pirsgirêka birayê wê (Branwîl) yê ko bivan sedeman mirî ber bi çav diket, li dawîyê kesatîya (Cîn)e û qehremana vê romanê ye, ko Şarlut rolê xwe têda dileyizît, bi taybet wek jinekê ko rolê perwerdê dibînît, ew baştirîn rolê bê alî û puzetîve, li gor karên din yê civakyên çewsêner dsedsala nuzdanda. bi kurtî romana (Cîn Ayer) serpehatîya geheştina zaroyekê ye li ser binemayên dilînî û ezmûnê vedigêrît, bi awayekî hemû bizavan diket da werarê biket û pê bigehît. divê romanê da(5) qûnaxên zelal hene û her yek girêdayî cihekê dîyarkirîye, zarokîniya (Cîn) li Gîts Hîd, perwerda wê li dibistana (Turnfîld) dîsan jîyana wê digel malbata (Rîfriz) li Murtun, şwîkirina wê ji (Rutişstr) li Fîrindin, dimaweyê van hemû ezmûnên cudada(Cîn) dibîte jineka geheştî û bixwebawer û jinek romaninvês, kudikarît dimaweyê wêda vegeêrte jîyana xweya bûrî. balkêşîya romanên Şarlutê di şeweyê wê yê nivêsinê û xeyala wêya kurda bû, bi awayekî mînakên bi bandor dirîyalîteya civakî da berçav dikirin, lewma her kesê wî çaxî jîyayî xwe têda didît. ev romane diçaxîda ji hemû alîyanve biserkeftîtirîn roman hate naskirin. êdî ji sala(1847)z da û şûnda Şarlut



wek romannivêsek di edebîyata Englîzî da hate dîtîn, her yekê ev romane nexandibît, lê li ser şaşa sînemayê dîtîye, ev romane wek karê sînemayî (42) caran hatîye bikarînan, yekem filmê Îtalîyê bê deng li sala(1910)z pêşkeş kirîye, paşan li Hulîod, Espanîya, Yunan, Englistanê pêşkeşkirîye, jibo zanîn li sala(1962)z sînema Misrê ji qehremanîya herdû honermendên navdarên Misrî (Macîda û Yehîya Şahîn) ev romane wek filmê sînemayî pêşkeş kirîye, niha jî ev romane li Lenden navê filmekê bixove digirît ji qehremanîya(Mîya Faşîkufska) ko rolê (Cîn Ayer) dileyzît, vî filmî bala bîneran kişand û bu cihê giringîyê ji alîyê rexnegiranve.

Her çende ev romane disedsala nuzdanda hatîye nivêsin, lê jibo cara 43 dibîte mijara derhênerên sînema cîhanî, livêrê pirs dihête kirin çima ev romane dibîte mijara derhênerên nû dikarên sînemayda?

1-jiber şeweyê cwan, rîyalîte û lihevhatîyê nivêsinna romanê, ji alîyê xanima (Şarlut Bruntî)ve.

2- jiber ko roman li ser sextîya jîyana kiçekê dpeyvît, bi taybet cihê zaroyên bê dayk û bab, dibistana hundirî ya kiçan ko di wî çaxî da, zaro wek zîndanîyan bûn û ji hemû xweşîyên jîyanê dibê bar bûn.

3- babetê romanê jîyana Şarlutê bi hemû sextîyên jîyanê ve bixove digirît, bi taybet piştî mirna dayka wê û berpirsîyarîya wê beranber xwîşk û birayên wê û jîyana diywara çaxê. ev romane girêdayî ezmûna malbata Bruntî bû, bi hemû corên nexoşîyanve. piştî serkeftin û navdarîya romana wê (Cîn Ayer), xelk li kesatîya romaninvîsî ya rasteqîne gerîya, jiberku wê nivêsnên xwe li jêr navê mêran (Kîurr Bîl) belav dikirin, piştî kesatîya wê wek xwedîya romanê aşkera bûy, êdî peywendî li gel nivêskarên mezinên çaxê xwe pey dakirin, wek romannivêse çaxê Vîkturî (Wilîyam Pakirî), rexinegir û dîruknivêse (C Atiş Lwîs), çîruknivêse û romannivêsa jin (Elîzabît Kaskîl) û lêkolera civakî (Hayît Martîno). romana wê (Cîn Ayer) dergehê çaxekê nû jibo edebîyata jinan vekir, wek kesatîya bihêza (Cîn) ko karîye xwedî îrade bît û biser hemû kêşeyên jîyanê û civakê da zal bît.

wek berî niha me anî ziman, ev romane li sala (1944) wek filmekê sinemayê navdar, ji qehremanîya stêra Hulîodê (Rubirt Stîvnsun) hate pêşkeş kirin, dîsan li sala(1969) derhênerê Îtalî (Franku Zfarîllî), ji qehremanîya (Şarlut Gnînsbra û wilîyam Hîrt) wek filmekê sînemayî yê bihîz



pêşkeş kir.

Dîsan li sala (2006) li telefzîona Berîtanî ev romana (Cîn Ayer) wek xelekên têlefzîonî, ji qehremanîya (Rûp Wîlsun û Tubî Stîfnz) hate pêşkeş kirin, ta niha jî ev romane cihê balkêşîya derhênerên sînamayê û bîneraye, aya nihênîya vê romanê çîye? diser hindêra ko (Cîn Ayer) jîyana kiçekê dihejarî, sextî û bêdadîyê da vedigêrêt. bi vî away nivîskar dikarît wek rastîya jîyanê û rîyalîteya civakî, bêy berjewendîyên taybet û dudilî êş û azarên xelkê xwe dimaweyê nivêsnên xweda ber bi cav biket, jiberku honer û edebîyat karekê mirovatî û neynka rastîyê ye, pêwîste her kes xwe têda bibînît, lê ger edeb û honer ne ji bo xizmeta mirovatîyê bît, aya berhemê edebî didîrokê da mîna vê romanê dê temen dirêj û zîndî mînît? her kes dikarît li gorey têgehiştina xwe vê pirsê bersv bidet.

Çavkanî:

١- عبدالباقي يوسف: شارلوت برونتي الروائية التي جسدت رؤمانسية الالم،
جريدة القدس العربية، ١٣ نوفمبر ٢٠١٣ ص ٦ .

2- E.F Benson : Charlotte Bronte, London, Rebecca jennins,



A Lesbian, History Britain, London 1932 p 82

3- Lucasta Miller: The Bronte Myth, London Random House, 2001,p 271

4- Fraser-Rebecca : 2008, charlotte Brote, A- Writers Liafe(2.ed) New York, Pagasus Books LLC. P 261

5- Phillips-Erans: J (2012)the Lonngcrotte: 500 years of a Biritish Fammily, Amazon, P 260-261